HDP

# BULTENA ÇANDINIYÊ

## Hilberina Çandiniyê ya Tirkiyeyê di sala 2021'ê de daket!

- Sala 2021'ê li gorî sala berê hilberîna nebatan kêm bû. Di 2021'ê de ji ber buhayê lêçûnê zêde bû, rençberan di hilberînê de zor û zahmetî dîtin. Buhayê zexîreyan pir zêde bû. Keda kedkarên çandiniyê pir zêde hat xwarin û mêtin.
- Li gorî daneyên Saziya Îstatistikan a Tirkiyeyê (TUÎK) a der barê hilberîna nebatên çandiniyê ya sala 2021'ê de, li gorî sala 2020'î zad û nebatên din ji sedî 13,4 kêm bû. Hilberîna sebzeyan ji sedî 1,8 zêde bû. Lê hilberîna fêkî û nebatên baharatê ji sedî 5,4 zêde bû.
- Li gorî daneyên TUÎK'ê, pîvana hilberînê ya sala 2021'ê; zad û berhemên çandiniyê 61,7 milyon ton, sebze 31,8 milyon ton, fêkî û gihayê vexwarin û baharatan 24,9 milyon ton pêk hat.
- Pîvana hilberînê ya berhemên zad li gorî salekê ji sedî 14,3 kêm bû. Di salekê de 31,9 mîlyon ton hat hilberîn.
- Di sala 2021'ê de hilberîna genim ji sedî 13,9 kêm bû û daket 17,7 mîlyon tonî. Hilberîna ceh ji sedî 30,7 kêm bû û daket 5,8 milyon tonî. Hilberîna çewderê ji sedî 32,4 kêm bû û daket 200 hezar tonî. Hilberîna genimokê ji sedî 12,2 kêm bû û daket 276 hezar tonî. Hilberîna garis ji sedî 3,8 kêm bû û daket 6,8 mîlyon tonî.
- Li gorî TUÎK'ê di sala 2021'ê de îstatîstîka hilberîna nebatên şolikan: Hilberîna nokan ji sedî 24,6 kêm bû û daket 475 hezar tonî. Hilberîna nîskê sor ji sedî 30,6 kêm bû û daket 228 hezar tonî. Hilberîna kartolan ji sedî 1,9 kêm bû û daket 5,1 milyon tonî. Hilberîna fasûliyê hişk ji sedî 9,1 kêm bû û daket 305 hezar tonî. Hilberîna tûtinê ji sedî 7,7 kêm bû û daket 73 hezar tonî. Hilberîna silkan (Pinçarê şekir) ji sedî 20,7 kêm bû. Daket ji sedî 18,3 mîlyon tonî.
- ·Li gorî daneyên TUÎK'ê ya 2021'ê îstatistîka hilberîna sebzeyan; Pîvazê hişk ji sedî 9,6, sîrê hişk ji sedî 13,5, îsotê avê ji sedî 11,9, xiyar ji sedî 0,2, kelem ji sedî 0,6 zêde bû. Fireng ji sedî 0,8 û spanak ji sedî 5,7 kêm bû.
- Li gorî daneyên TÛÎK'ê yê 2021'ê îstatîstîka hilberîna fêkiyan; li gorî sala 2020'î hilberîna qeyisî ji sedî 4, hilberîna tirî ji sedî 12,8, hilberîna gelyas ji sedî 4,8 kem bû. Hilberîna sêvan ji sedî 4,5, hilberîna çîlekan ji sedî 22,4, hilberîna zeytûnan ji sedî 32,1 hilberîna mandalina ji sedî 14,7, hilberîna porteqalan ji sedî 30,6, hilberîna limonan ji sedî 30,4, ji fekiyên qalik hişk hilberîna findiqan ji sedî 2,9 zêde bû. Hilberîna fisteqan ji sedî 59,7 kêm bû. Hilberîna mûzan ji sedî 21,3 zêde bû. Hilberîna hejîran ji wekî berê ma û 320 hezar ton hatin komkirin.
- Li gorî rapora dawî ya Rêxistina Pêşxistina Hevkariya Aborî (OECD); li Tirkiyeyê salane zêdebûna buhayê zexîreyan; di meha îlonê de ji sedî 28.8, di meha cotmehê de ji sedî 27.4 zêde bû. Dema li gorî welatê cîran bê qiyaskirin, buhayê zexîreyan herî zêde li Tirkiyeyê bilind bûye. Di aliyê buha de Tirkiye bûye welatê yekem. Piştî Tirkiyeyê, Kolombiya ji sedî 13,7 buha bûye û ketiye rêza welatê duyemîn. Avusturalya bi buhabûna zexireyan a ji sedî 10,6 ketiye rêza sêyemîn.
- Li gorî mehên cotmehê yên 2020-2021'an, di nava salekê de deynê saziyen finansê u bankayan ê li cotkaran ji sedî 18 zêde bûye. Deynê li cotkaran 30 milyar zêde bûye û derketiye 177 milyar TL'yî. Nêzî 166 mîlyar TL deynê bankayan û 11 milyar TL jî deynê Kooperatifên Krediya Çandineyê li cotkaran e. Dema deynê piyasê jî li van deynan zêde dibe, deynê cotkaran derketiye 227 milyar TL'yî.

- Cotkar di bin deynê giran de hewl didin hilberina candiniyê bikin. Lê Midûrê Kooperatifa Krediyê ya Çandiniyê Fahrettin Poyras ê ji 8 deverên cuda muçe digire mehane qezenca wî li gorî zêdebûna doviz kurê zêde dibe. Mehane muçeya wî ji 180 hezar TL derketiye 230 hezar TL'yî.
- Îqtîdara AKP'ê ku di mijara deynê cotkaran de çareseriyê pêş naxe, ji sala 2019'an heta niha, 242 şîrketên mezin ên ku zêdeyî 25 mîlyon deynê wan heye, deynê wan ê bi qasî 75 milyar TL ji nûve plan kiriye.
- Di 1'ê tîrmehê de buhayê lîtreya şîr bi 3,2 TL'yan hatibû diyarkirin. Lê piştî 8'ê kanûnê lîtreya şîr derxistin 4.7 TL'yan.
- Di meha tîrmehê de çewalê êmê sewalên şîr 150 TL bû. Îro ji sedî 50 zem bû. Çewalê herî kêm 225 TL ye.
- Li gorî daneyên Komeleya Xwedîkirina Dewarê Dermale, Goşt û Şîr (TUSEDAD) lîrayê tirk zû qîmeta xwe winda dike. Ji ber sektora goşt û şîr lêçûn zede kiriye, zincîra tedarikê hatiye asta şikandinê. Eger bi lez tedbîr neyê girtin dê di meha havînê de qeyrana zexîreyan pêş bikeve. Ji ber ku kesê sewalan xwedî dike, lîtreya şîr bi qasî 5,5 TL hildiberîne, lê li gorî piyasê lîtreya şîr bi 4,70 TL ye. Ji ber vê yekê sewalkar zerarê dike.

**Hilberîna genim di 30 salên dawî de zêde nabe!**

- Li gor daneyên texmînên duyemîn hilberîna nebatên 2021'an ên TUÎK'ê, hilberîna genim ji ber hişkesaliyê bû 17,7 milyon ton. Ev rêjeya genim rêjeya herî kêm ya 14 sala ye.
- Di sala 1991'an de ango 30 sal berê nifûsa Tirkiyeyê 56 milyon bû û salane hilberîna genim jî 20,4 milyon ton bû. Di sala 2021'an de nifûs ji sedî 50 zêde bûye û bûye 84 milyon lê hilberina genim a salane zêde nebûye car carna kêm jî bûye. Ji aliyê din di nav 30 salan de cihê zeviyan ji sedî 39 kêm bûye û ji 96 milyon dektaran ketiye 69 milyon dekaran.
- Ofîsa Berhemên Axê (TMO) ragihand ku dê ji bo di meha çileyan 2022'yan de piyasayê sererast bike û milyon û 220 hezar ton zad bifiroşe. Li ser vê yekê genim ê ku dibe arvan ji sedî 23 buha kirin û tona wî kirin 3 hezar û 250 TL, ceh jî ji sedî 24 buha kirin û tona wî kirin 2 hezar û 550 TL.

**Bihayên Xurekan Her Roj Zêdetir Dibin**

- Li gor daneyên Endeksa Bihayên Xurekan ên Gerdunî ya meha kanûnê ku Rêxistina Çandinî û Xurekan (FAO) a Neteweyên Yekbûyî (NY) parve kir di meha kanûnê de Endeksa Bihayên Xurekan (FAO) ji sedî 0,9 kêm bûye û hatiye ser 133,7 pûan, li gor salane jî ji sedî 23,1 zêde bûye û bûye ji sedî 125,7. Heke Endeksa Bihayên Xurekan ya FAO'yê ya 2020'î ku rêjeya wê ji sedî 98,1 bû li ber çav bê girtin, bihayên xurekan tim zêde bûne.
- Li Tirkiyeyê bihayên xurekan her roj zêde dibin. Mûçeyê kêmtirîn ê ku 4 hezar û 250 TL hatiye diyarkirin têra debara gel nake. Dema zema li ser mûçeyê kêmtirîn û zema li ser pêwistiyên jiyanê yên sereke bên muqayesekirin wê demê rastiya ku gel êdî nikare wek berê dan û standinê bike, derdikeve holê. Lêçûnên perwerde û xurekên sereke yên malbateke 4 ferdî ya herî kêm 2 hezar û 38 TL ye. Li gor buhayên rojane 5 LT rûn bi 135 TL, kîloyeke rûnênivîşk bi 80 TL, koliya hêkan 40 TL, kîloyeke avafiringiya 10 TL, paketekî mikarna 6,5 TL, kîloyeke nîsk 30 TL, kîloyeke savar 16 TL, kîloyeke pirinc 22 TL, 3 kîlo şekir 23 TL, lîtreyeke şîr 13 TL, 2 kîlo mast 22 TL, 2 kîlo arvan 25 TL ye.

- Li gor daneyên TUÎK'ê enflasyona meha kanûnê ji sedî 13 ye enflasyona salane jî ji sedî 36 ye. Li gor daneyên Koma Lêkolînê ya Enflasyonê (ENAG) enflasyona salane ji sedî 82 ye.
- Li gor daneyên DÎSK-AR'ê ji nifûsê sedî 20 ku xwediyê dahata herî kêm e di xurekan de ji sedî 64,6, ji sedî 20 ya koma duyemîn ji sedî 56,4, teqewît jî ji 55,8 enflasyon pêk hatiye.
- Li gor piyasaya endeksên berhemên çandiniyê Seneda Berhemên Elektronîk, Borsaya Pisporiya Berhemên Tirkiyeyê(TURİB) di salekî de ji sedî sed zêdetir bûye. Endeksa Zadan ya Tirkiyeyê di nav salekî de ji sedî 107,01 zêdetir bûye; Di Endeksên genim de ji sedî 105,29, di Endeksa Teqewît ya Genim de ji sedî 107,15 bihabûn çêbû. Endeksa Genimê ji bo Mikarne de jî di salekî de ji sedî 94,48 zêdebûn çêbû. Endeksa Misir ya TURİB di salekî de ji sedî 124,50, Endeksa Ceh a TURİB'ê ji sedî 136,37 biha bûye.

**Rêjeya zêdebûna bihayê salane ji bo hin fêkî û sebzeyên teze/hişk**

| Berhem | Rêje |
|---|---|
| Kartol | %115 |
| Balîcan | %97 |
| Îsota tûjikî | %73 |
| Xiyar | %68 |
| Îsota Çaliston | %64 |
| Gêzer | %43 |
| Mendelîn | %37 |
| Hirmîr | %32 |
| Hinar | %31 |
| Mişmişên Hişkkirî | %89 |

**Çavkanî: TUÎK**

- Di meha kanûnê de piştî daketina TL li hember diravên biyanî dolarek dolar bû 18 TL, ji ber vê sedemê hema bêje buhayên berheman zêde bû. Lê belê piştre dolar daket 13 TL'yan, lê erzanek li ser bihayê xwarinê nehat kirin.
- Di 1 û 9'ê kanûnê de bi zêdebûna bihaya gubreyê re bihayê gubre bi giştî 4 hezar TL zêde bû. Lê belê bi bihabûna TL'yê ya li hember dolarê gubre hezar û 100 TL kêm bû. Bi vî awayî hikûmeta AKP'ê di meha kanûnê de di encama polîtîkaya diravî ya biyanî de bi qasî 2 hezar û 900 TL zêdekirina gubreyê lêçûna cotkaran zêde kir.
- Gubreya ku par toneya wê bi hezar û 800 TL dihat firotin, îsal ji ber pandemiyê û zêdebûna bihayan li welatên Ewropayê di meha tebax û îlonê de derket 8 hezar lîreyî. Lê piştî meha cotemehê bi hinceta zêdebûn li kûrê, bihaya wê bû 16 hezar lire û rekora xwe ya dîrokî tomar kir.
- Bihayên niha yên gubreya 2022'yan;
  Buhayên tonek gubreyan a Krediya Çandiniyê DAP: 14 hezar û 250 TL.
  Buhayên tonek gubreyan a Krediya Çandiniyê Gubreya URE: 14 hezar û 250 TL.
  Buhayên gubreyên Krediya Ziraetê 20 20 Z: 8 hezar û 700 TL.
  Gubreya Krediya Çandiniyê 20 20: 8 û 400 TL
- Her sal hewcedariya Tirkiyeyê bi gubreya ure 3 milyon ton e, 2,5 milyon ton di çandiniyê û 500 hezar ton jî di pîşesaziyê de tê bikaranîn. Tevî ku hin şîrket di bazara navxweyî de gubreya urea hilberînin jî, Tirkiye piraniya pêdiviyên xwe bi îthalatê pêk tîne.

- Li gorî daneyên TUÎK'ê, dema ku Tirkiyeyê di navbera meha çile-cotmeha 2021’an de 2 milyon û 221 hezar ton gubreya ûre îthal kir, bihaya ton a gubreya îthal 344 dolar bû.
- Di sala 2021’an de welatê Uman bi milyonek û 243 hezar ton îthalata gubreya ure bû yekem, piştî wê Misir bi 467 hezar ton, Turkmenistan bi 230 hezar ton û Îran bi 155 hezar ton hatin.
- Ji ber ku gubreya ure ku bi 344 dolarî dihat hinartin, bi nirxê zêdetirî hezar dolarî ji cotkaran re hat firotin, diyar dike ku ji ser gubreyê sûd ji şîrketan re tê dayîn.

## ·Berhemên Çandinî yên Demsalî ya Meha Kanûnê




- **Bihayên hin berhemên demsalî**

| Berhem Kg | Mêrsîn ser erd | Mêrsîn Hal | Mêrsîn Market | Hal Stenbol | Market Stenbol |
|---|---|---|---|---|---|
| **Biyok** | **0,50-5 TL** | **1-6,5 TL** | **7- 9 TL** | **3-6 TL** | **8-12 TL** |
| **Pirase** | **0,50-2 TL** | **1,50 -3 TL** | **8-10 TL** | **4-5 TL** | **10-12TL** |
| **Brokolî** | **0,25-3TL** | **1-5 TL** | **10-13TL** | **4-5 TL** | **10-12 TL** |
| **Mendelîna** | **0,25-3 TL** | **0,75 -6 TL** | **8-10 TL** | **3-12 TL** | **13-25 TL** |
| **Gulkelem** | **0,50-1 TL** | **1,50-2,50 TL** | **5-7 TL** | **2-3 TL** | **7-25 TL** |
| **Îspenex** | **0,25-1,50TL** | **1,50 -2,50 TL** | **7-15 TL** | **1-4TL** | **11-17 TL** |
| **Kelem** | **0,25- 1,5 TL** | **1,25-2,50 TL** | **4-5 TL** | **3-4 TL** | **4-8 TL** |
| **Hinar** | **1-5 TL** | **2-7 TL** | **10-12 TL** | **5-10 TL** | **8-15 TL** |